kurdisch

TECHNOLOGIEZENTRUM GLEHN

# Karkirina ewleh di gel xwarekan

Ragihandina Rêveberiya Tendurustiya te derbarê xalên 42/43 yên Qanûna Parastina li hemberî nexweşiyên înfeksiyonî (IFSG)



TECHNOLOGIEZENTRUM GLEHN

## Fêrkirina taybet a kedkaran di dema karkirina di gel xwarekan da



1

### Hewcetiya çi kesî bi fêrbûnê heye

Kesên ku xwarekê berhem tînin, hildigirin an raber dikin, wek mînak nanpêj, qesab (goştbirr), kedkarên aşpêjxxaneyê, radestker û firoşyarên xwarekên pakêtnekirî.



2

### Kîjan molet girîng in

Kesê ku karê wî/wê bi xwarekan e, hewcetî bi fêrbûnê heye ku têkildarî zêdetir ji sê mehan pêştir nebe. Ji bilî vê yekê ew divê biselimîne ku zanista wî berdewam hatiye birojkirin.



3

### Xwarekên hesas

Hokarên nexweşiyê renge di hin xwarekan da gelekî hêsan zêde bibin, wek mînak bi taybet derbarê goşt, goştê balendeyan, masî, berhemên hêkan, şîr, bestenî (berfeşîr), zîlik, mayonêz (Mayonnaise) û hwd.



4

### Qedexetiyên çalakiyê

Bi taybet derbarê nexweşiyên vegir, te destûra xwe ya berhemanîn an amadekirina xwarekê tuneye. Di vê rewşê da divê wek mînak di rewşa îzhal an vereşiyanê derdem serokê xwe haydar bikî.



5

### Paqijî

Paqijî di dema amadekirina xwarekê roleke girîng heye, û armanca wê ev in: Paqijiya kesane, paqijiya xwarekê, paqijiya cihê karkirinê.



6

### Mafû berpirsên bersivdanê

Belgeya rêber a Rêveberiya Tendurustiyê agahîne bi hûrgilî derbarê karkirina di gel madeyên xwarekê (xwardemenî) raber dike. Her wiha me hemî berpirsên bersivdanê ji bo te (wwe) kom kirine.

# 1 | Hewcetiya çi kesî bi fêrbûnê heye



Kedkarên li xwaringehan



Fêrkar



Nanpêj, şêranîpêj



Goştbirr (qesab)



Kesên çalak bi awayê xwebexş

## 2 | Kîjan molet girîng in

- Di dema ddestpêkirina çalakiyê da, fêrkirina seretayî nabe ku têkildarî sê mehan berê be.
- Di roja karî ya yekem da divê ku tu ji aliyê xwediyê kar va werî fêrkirin.
- Beriya bidawîhatina 2 salanm fêrbûna din pêwîst e.
- Di rewşa ku kesekî heta sala 2001ê guwahiyeke tendurustiyê li gorî Qanûna federal a nexweşiyên vegir wergirtibe û bikare fêrkariyên din biselimîne da, fêrbûnê pêwîst nake.

## 3 | Xwarekên hesas

Ji wan xwardemeniyên ku ji bo wan fêrkaarî pêwîst e, ev in:



**Şîr û berhemên pêkhatî ji wî**



**Berfeşîr û berhemên nîv-amadekirî yên wê**



**Goşt, goştê balendeyan û berhemên wan**



**Masî, kêvjing an nerm-leş û Berhemên wan**



**Berhemên Hêkan**



**Xwareka zarokên berşîr û biçûk**



**Zîlik (Sprossen) û giyayên nûşînbûyî ji bo xwarina bi xavî û her wiha tovik ji bo şînkirina zîlik û giyayên nûşînbûyî ji bo xwarina bi xavî**



**Berhemên hevîrî bi madeyên tijîker an rûkêşa tam nepatî an tam germ-nekirî**



**salatên xweştam, salata mêwe û pincarên xav û salata kartolan, Madeyên çêjder, Mayonêz, sosên din ên emolsiyonkirî, hevîrtirşên (yeast) xwarinê**

# 4 | Qedexetiyên çalakiyê



Qanûan parastina li hemberî nexweşiyên înfeksiyonî diyar dike ku eger di kesekî da nîşaneyên nexweşiyê xuya bibin ku nîşana nexweşiyeke jêrê bin, an ji aliyê bijîşkekî va hatibe diyarkirin, ew nabe ku di têkiliya di gel madeyên xwarinî daa be:

- Îltihaba înfeksiyonî ya xedar a perdeya hundirîn a mêde û rûviyê biçûk (îzhala vegir a diyarbûyî bi awayê nişkêvayî) ya ji ber Bakteriyên Salmonellen, Shigellen, Bakteriya Kolêreyê, Staphylokokken, Campylobacter, Rotaviren An hokarên din ên pêkênerê Îzhal anku Vijikîbûnê
- Bakteriyên ‚Escherichia coli-Bakterien'
- Vîbrîiyoyên Kolêreyê (Choleravibrionen)
- Şînik anku Tîfûs (Typhus) anku Şibhî-Şînik
- Vîrûsa Hêpatîta A an E'yê (hawkirina Mêlakê)
- Te birînên înfeksiyonî (kêmgirtin) an nexweşiya çermî heye ku derbarê wan ev îmkan heye ku hokarên wan ên nexweşîzê bi rêya madeyên xwarinê derbasî kesên din bibin.

Nîşaneyên jêrê, elametên nexweşiyên navbirî ne:

- Îzhal di gel zêde ji du caran gûkirina avkî ya reyîn di rojê da, renge rewşa dilrabûn, vereşiyan Û ta (germahiya leşî)
- Taya zêde hevrê di gel serêş, dilêş an êşa movikan a giran û qebizbûna zik anku zikgirî (Verstopfung) (tenê piştî Çend rojan îzhala giran) nîşaneyên Şînik anku Tîfûs (Typhus) anku Şibhî-Şînikê ne.
- Îzhalên sipî yên bi rengê şîr hevrê di gel jidestdana gelek av û şilav, ji nîşaneyên taybetî Kolêreyê (Cholera) ne.
- Zerbûna çerm û kurtika çavan hevrê di gel lawazî û nebûna meyl û îştihaya xwarinê nîşana nexweşiya Hêpatîta A an E'yê ne.
- Birîn an cihên servekirî yên nexweşiyên çermî di rewşekê da ku sor bûbin û bi madeyeke zeliqokî û şil hatibin werdan, teşenenekirî an werimî ne û renge înfekte û kêmgirtî bin.

Di rewşa ku nîşaaneyên navbirî yên nexweşiyê xuya bibin, kesê tûşbûyî pêwîst e ku di gel bijîşkê malbatê an Bijîşkê şirketê bişêwire û ji wî/wê ra bibêje ku kar û barê wî di gel madeyên xwarinê ye. Ji bilî vê yekê, kesên tûşbûyî erkdar e ku bilez berpirsê berztir ji xwe derbarê vê mijarê haydar bike ku ew di heyama nexweşiya xwe da nikare di gel madeyên xwarinê kar bike. Binpêkirin wek binpêkirina rêzikên qanûnî an kiryara sûcdarane dê were şopandin.



## Paqijiya kesane

- Şûştina destan
- Deranîna xxeml û zîvan
- Kincên parastinî yên paqij
- Nekuxîn An nebênijîn ber bi madeyên xwariniyê
- Banda birînê ji bo birînên biçûk
- Bikarneanîna laka neynûkan an gel'a neynûkan



## Paqijiya madeyên xwariniyê

Madeyên xwarinî yên xera dibin
Divê bi awayê hênik bên ragirtin û bilez
Bên berhemanîn û bilez bên Mesrefkirin.

Goştê gelekî qerisî di germahiya herî pirr
7 derece (7 Grad Celsius) vekin û xwarekan
Têra xwe bi qasî pêwîst germ bikin.



## Paqijiya cihê kar

Tevahiya atmosfera cihê kar divê Di rewşa rêkûpêk û biserûber da Were ragirtin.

Hemî destmalên ku alavên aşpêjxaneyê û amûrên din bi wan tên paqijkirin Divê bi awayê rojane bên guhertin Mesrefkirin. Madeyên paqijker û dijî înfeksiyonê divê dûr û cuda ji beşa madeyên xwarekê bên ragirtin.

## 6 | Mafû berpirsên bersivdanê

Ev broşûr dîmeneke giştî ya sseretayî ji karkirina ewleh di gel Madeyên xwariniyê raber dike. Bingeha qanûnî, qanûna têkildarî pêşîlêgirtin û têkoşîna dijî Nexweşiyên înfeksiyonî di mirovan da (Qanûna Parastina li hemberî nexweşiyên înfeksiyonî (IFSG)) ye, Ku tu dikarî nivîsa wê li vir bibînî:

**https://www.gesetze-im-internet.de/ifsg**
▶ Beşa 8an
Pêdiviyên paqijiyê ji bo kedkaran
Di dema karkirina di gel madeyên xwariniyê da

**https://www.rki.de/DE/Content/Infekt/IfSG/Belehrungsbogen/belehrungsbogen_node.html**
Broşûra ragihandinê ya enistîtûya Robert Koch
Bi zimanên din ên neteweyî

**Navnivîsandin ji bo fêrbûna online**
über den Link Ihrer Stadt/Ihres Kreises

**Agahiyên weşanger:**

TECHNOLOGIEZENTRUM
GLEHN

**Dîzayn û mafê kopîkirinê (Urheberrecht):**
Technologiezentrum Glehn
Hauptstraße 74 - 76
41352 Korschenbroich-Glehn

02182 / 85 07 65
info@tz-glehn.de
**www.tz-glehn.de**